

Cejna Newrozê

Di destpêka dersê de, mamoste ji xwendekaran pirsî, ku ew bibêjin, îro çi roj e, kîjan meh û çendê mehê ye. Hinek zarokan destên xwe bilind kirin û ji wan sê kesan cihê cihê bersîv dan û gotin:
„Îro, îro e, meha sêyemîn; adar e û 21ê mehê ye.,,
Piştî van bersîvan mamoste, cardin pirsî: „Baş e, gelo, 21ê Adarê çi tîne bîra we?“

Ji dawiya polê, Newrozê bi coş, bi hev re her du destên xwe hildan, pê re jî rabû ser piyan û zû zû, li ser hev û dengê bilind got: „Ez, ez, ez dixwazim bibêjim, Mamoste, ez dixwazim!“
Mamoste mizicî û got: „Belê, Newroz, kanî, ji me re bibêjî, 21ê Adarê çi ye?“
Newrozê careke din bi kelecana got: „Mamoste, 21ê Adarê, Newroz e, Newroz!“
Mamoste dîsa bi ken got: „Baş e, Newroz, navê te jî Newroz e, tu dizanî ku Newroz çi ye?“
Newrozê, bixwebawerî got: „Newroz, cejn e, cejna me Kurdan e!“
Mamoste: „Newroza delal, ma gelo tu dizanî, Newroz cejna çi ye, yan na?“
Newroz hinekî sekinî, fikirî, xwest bersîvê bide lê ji ber nizanibû, bi wateya nabûnê serê xwe hejand.
Mamoste jî got: „Xem nake, dibe ku hûn zêde nizanibin, ez ê ji we re bibêjim, bê Newroz cejna çi ye. Newroz li gorî salnameya kurdî ya berê, sersala Kurdan e û mîna cejna biharê jî hatiye/tê pîrozkirin.

Lê çîrokeke Newrozê din jî heye. Dibêjin, bi hazaran sal berê, li welatê Kurdan qralekî navê wî Dehaq hebûye. Dehaq mirovekî gelekî zalim bûye. Wî li xelkê Kurd û yên derdorê pir zordarî û neheqî kiriye. Ji ber vê jî bi pêşengiya yekî Kurd, navê wî Kawayê Hesinkar e, xelkê Kurd li hemberî zalimiya Dehaq, serî hildan e û êrîşî qesra wî kirine, qesr şewitandine û li her derê agir hatiye dadan.

Piştî hilweşandina desthiltdariya Dehaqê zulimkar, yekî Kurd, bi navê Ferîdûn, bûye qral û êdî gelê Kurd û yên din ji zordestiyê rizgar bûne û bi aramî û azadî li welatê xwe jiyana xwe berdewam kirine.

Ji wê rojê û pê ve gelê Kurd, her sal, ev roj neba bi tenê wek cejna sersal û biharê, êdî mîna cejna azadiyê jî pîroz kirine û hîn jî dikin. Agir dadan, bûye nîşana Newrozê. Lewma dema pîrozkirina Kurdan, her sal li Kurdistanê û deverên din yên lê dijîn, di 21ê Adarê de cejna Newrozê pîroz dikin.

Di şahiyên Newrozê her kes kincên xwe yên netewî xweşik; kesk, sor û zer li xwe dike û diçin qada Newrozê. Li vir agirê Newrozê tê dadan. Berê her kes xwe di ser Agirê Newrozê yê ku pîroz tê zanîn re qewz dike. Di dû re li dora êgir, bi coşek mezin dîlan tê girtin û bi gotina helbest û stranên govend berdewan dike û bi dengê hêl dibêjin: `Bijî Newroz, Newroz pîroz be!`

Dîsa bêtî pîrozkirinê giştî jî, di Newrozê de Kurdan diçin, malên hev û xwarinên xweş, taybetî ji bo Newrozê hatine çêkirin tîna xwarin.

Erê, Newroz ji bo Kurdan pir hêja ye. Agirê Newrozê pîroz e. Xwe di ser agirê Newrozê re qewz kirin, ji baweriya ku agirê pîroz hemû tiştên xerab dişewitîne û mirovan ji xerabiyê paqij dike tê. Ji ber vê jî Kurdan gelekî ji Newrozê hez dikin. Navê heyva adarê re Newroz jî tê gotin. Kulîlkek heye ku di dema Newrozê de çêdibe, Kurdan navê wê jî kirine kulîlka Newrozê û gelek Kurd, wek Newroza me, navê zarokên xwe jî dikin Newroz.

Belê, cejna Newrozê, wate, dîrok û çîroka wê ev e û pîrozkirina wê bi vî awayî ye.
Newroza we jî pîroz be zarokên delal!“

1. Newroz cejna çi ye?
2. Dehaq kî ye û çi kiriye?
3. Çîroka Newrozê çawa ye?
4. Newroz kengî tê pîrozkirin?
5. Kurd çima Newrozê pîroz dikin?
6. Kawayê Hesinkar û Ferîdûn kî ne?
7. Malbatên we jî Newrozê pîroz dikin û çawa?
8. Hûn tu caran tev li şahiyên Newrozê bûne, şahî çawa hat pîrozkirin?
9. Li ser wateyên peyvên jêrîn bipeyivin, bi wan hevokên nû ava bikin û li deftera xwe binivîsin?
(*cejn, pîroz, coş, gel, netewî, welat, pêşengî, azadî, rizgarî, aramî, jiyana, serhidan, zulimkar, zalim, zordestî, desthilatdarî, hilweşandin, sersal, salname*)

* **Karê Malê:** Hûn jî li ser Newrozê lêkolînekê çêbikin û encamên wê, di darsa bê de bi devikî û nivîskî pêşkêş bikin!